

Dr.Ekrem Önen

ekremonen@hotmail.com

Medya Kurdî “struktûr û wezîfe” (structural functionalism)

- Çend gotin li ser têgihîştina rojnamegerîyê
- Struktura avkirina dezgehên medya li Başûrê kurdistanê
- Rola medya di sazkirina raya giştî de
- Rola medya di rojev çêkirinê de
- Manîpulyasyon di medyayê de
- Rola medya di sazkirina şuura netewî û paraztina evlekarîya netewî de
- Di medya de Autokontrol, kontrol û sensur û Rojnamegerîya objektîv
- Wekhevî ya Jin û Mêr di medya Kurdîde
- Rola avayên bingehe bajar û Gundan di belav kirina medya civakî û çapkirî de
- Unîversîteyên Başûrê kurdîstanê û bêşê wan yên Rojnamegerîyê
- Tunebûna Ajanse nûçeyan a Kurdî bi rêk pêk û teesîrên wê li ser medya Kurdî
- Rola Olî (Dîn) Di TRT de (TRT,TRT 6, TRT 1, TRT Awaz, TRT Anadolu,)

Wek tê zanîn ji roja ku Medya wek pirs derketîye ortê mirovan gelek metodên lêkolînên ilmî di pirs medya de afirandine, û di encamê van metodên lêkolinan de gelek lêkolîn îroj li ser medya hatine kirin. Yek ji van metodên lêkolînê li ser medya ku gelek efektîv,Unîversal û nuha ku li cihanê bêhtir belave, metoda lêkolînê a ku bi navê “struktûr û wezîfe” (structural functionalism) medyayê ye. Wek tê zanîn bi vê metodê lêkolîn li ser medyayê mirov bêhtirîn cara dighêje encamek rast di derbarê struktûr û wezîfa medya yê li welatekî. Emê jî nuha bi vê metodê heger ne pir fireh jî be emê bixazin li rewş a medya kurdî bi tevayî û bi teybet a baş ûrê Kurdistanê binerin.

Medya yek ji fenomenên civakî yê herî grînge. Di van pêncî salê dawîde pêş ketina teknolojîyê, mirov dikare bêje hema hema teesîr li ser hemû alatên ragîhandinê kir. Bi van teesîrên ku hêdî hêdî (ewrîm) çêbûn pêş ketin di alatên ragîhandinê de bi xwer anî herweha di vê protsesê de gelek alatên ragîhandinê en nuh ji pêyda bûn.

Jibo em bikaribin rewş a medya kurdî baş tede bighên bi guman lazime em li hinek protsesên medya yê ku unîversalî û hemû welat û tevaya cihanê tede derbas dibin bi bir binin wê demê ewê rewş a medya Kurdî hin baş tir bê zelal kirin.

Wek tê zanîn heger mirov li protsesa medya yê a ku li gelek welatên cihanê tede derbas diba binere mirov dikare vêya dabeş î sê qonaxa bike.

Qonaxa 1-Medya Partîyan, 2-medya profesyonel, 3- medya ticarî (kommersîal).

Wek tê zanîn medya partîyan li hemû welatan roleke grîng û erênî (pozîtîv) listîye bi teybet li gelek welatên ku tekoş îna rizgarîya netewî dane û hin didin. Medya partîyan di tekoş îna rizgarîya netewî a gelan de roleke yekgirtin, motîvasyon û mobilîzekirina civatê saz dike her weha di rojev çêkirin û di sazkirina raya giştî de roleke girîng dileyze. Wek tê zanîn îroj mirov dikare bêje li behtirîn welatên cihanê medya partîyan rola xwe dagirtîye û cihê xwe bêhtir dayê medya profesyonel û ticarî (kommersîal) heta mirov dikare bêje li bêhtirîn welatan nuha êdî medya profesyonel jî cihê xwe daye medya kommersîal. Piş tî ku li bêhtirîn welatan tekoş îna rizgarîya netewî dighê armanca xwe an bi awayekî din dewlet li welatekî wek sîstem baş bi cih dibe her çuqas medya partîyan her dimîne jî lê li

teveya welat cihê medya partîyan medya profesyonel digre a ku bes berjewendîyê dewlet û welat diparêze. Bi pêş ketina welatekî ji alî aborî civakî û kulturî, rê li ber medya ticarî (kommersîal) vedike û hêdî hêdî medya ticarî (kommersîal) li tevaya welat hakim dibe. Îroj em dikarin bêjin li bêhtirîn welatên ji alî teknoloji, aborî, civakî, kulturî pêş ketine li welatên wan her çuqas medya partîyan û profesyonel hinek hebejî lê medya komersîal hakime, ew rojwê çê dike û raya giş tî saz dike.

Di van qonaxên ku li jor me behsa wan kir ku medya tê de derbas dibe ka em li rewş a kurdistanê binerin. Li Kurdistanê rewş eke teybet heye dagirkirina Kurdistanê hiş tîye heta nuha jî ku li kurdistanê medya partîyan hakim be. Medya partîyan li kurdistanê roleke erênî listîye û nuha jî di leyze. Bê guman rewş a medya li her perçeyekî kurdistanê jî teybet. Li Kurdistanê bakur,rojhilat û rojava ji ber sebebê objektîv medya partîyan hakime û ew roleke teybet dileyzin. Li baş ûrê kurdistanê rewş eke teybet heye û gelek glî û gazin ji wan tê kirin ku çima heta nuha li wir medya profesyonel nikare bi sazîkirin û roleke serekî bileyze. Ev glî û gazin ji ber wêye ku li baş ûrê kurdistanê, ev 20 salin de-facto dewletek hatîye avakirin û bêhtirîn înstîtuyên dewletê hatine avakirin. Bê guman di vî 20 salî de li baş ûrê Kurdistanê dikarîbû sistemek bi hata avakirin ku Medya hereme Kurdistanê derbasî medya profesyonel biba. Her çuqas em li protsesa derbasbûna medya yê ji qonqkekê derbasî qonaxa din li welatên chanê binerin ev qonax mirov dikare bêje dor 50 salî buye ev ji bo demên berê, lê divan 20 salên dawî de gurtinên teknoloji, aborî û kulturî ku li cîhanê çêbûne beramberî 100 salên demê kevne, dixwazim bêjim li baş ûrê kurdistanê ev protsesa ku li welatên din di 50 salîde bû li kurdistanê dikarî bû di van 20 salên dawîde bibûya. Ji ber ku bi destxistina teknolojiyê û înfomasyone nuha ji demên berî hîn bêtir hesanê, heger mirov miqayese bike dewleta Îsraîl di sala 1942 de hate avakirin di navbera 18 salande yanî di sala 1960 de bomba atome çêkirin. Tevî salên 1960 bi destxistina teknoloji û înfomasyone ne wek nuha hesan bû. Heger deh panzde sal berê hukûmeta herema kurdistanê sistemek û yasayek medya yê bi rêk û pêk bihata danîn bê guman ewê îroj Medya herema kurdistanê di qonqxeke din deba. Kurd hemû îmkânên wan hebûn, bes sistem lazim bu, teknîka medya bi dest xistin gelek hesane her weha ew teknîk bi dest xistin, îmkânên madî têra xwe hebû her weha pisporên kurdan her çuqas ne pirbejî lê hebûn, çima protsesa guhertina medya li hereme kurdistanê bi ser neket? Diyarê di derkê de ş aş îtû hebû. Bi ya min ş aş îtû di wir debû ku ev kar ne bi pisporan bi qerarên polîtîk hate meş andin.

Wek tê zanîn di medya de ya herî îroj bi bandor Televîzyone emê jî di vê nivîsêde bixwazin granîyê bidin ser televîyonên Kurdî. Ji bo çî televîzyon ne radyo an Rojname an beş ekî medyayê yê din? Yek jê Televîzyon di mala her kesekî ku ne pir halxweş jî be televîzyonek heye û nuha bi destxistina televîyonê ji bo herkesekî gelek hesan bûye, dudu wek mînak radyo û rojname hew mirov dikare bixwîne û guhdar bike lê televîzyon tiş tê dixwaze bide mirovan bi deng û hereket bi hevreye, ji ber wê ji ji bo mirova bi tevayî ji halatên din ên medyayê balkêş tire û teesîra wê bêhtire. Di pêş de bê guman înternet di kare bibe alternatîvê televîzyonê lê îroj heger mirov lê binere mirov dibîne ku Înternet yek jê ne hewqas wek televîzyonê belaye her weha ji bo karanîna Internetê hinek zanebûn ji lazime. Lê her çuqas em behsa televîzyonê bi giranî bikin jî bê guman ew di eynî wextê de behsa halatên ragihandinê yê din jî be. Ji ber ku yek ji wezîfa Medya yê esasî Nuçe ye her weha nuçe di eynî wext de zanebûnê dide civatê. Di rupelên rojname, malperên înternetê û di seetên xeberade tiş tên radyo û televîzyon dide zanebune. Ji ber wê jî dema behsa beş ekî medya bibe ew di eynî wextê de behsa tevaya medyayê ye.

Mirov dikare wezîfa Medyayê di van xalanda eş kere bike: 1.Nûçe, 2. Rola pozîtîv bi hevra jiyana civatê, 3. Motîvasyon, 4. Munaqes e – Diyalog, 5. Perwerde, 6. Pêş xistina Kûltûrî, 7. Ş ahî, 8.Yekgirtin civakî-netewî.

Nûçe dayin yek ji vezîfa medya yê ya herî grînge di rêya nûçe dayinên de her veba medya zanebûnê jî dide civatê her weha medya di rêya Belavkirina înfomasyona civakî û kulturî ji bo bi hevra jîyana civaka heterojen (pir reng) roleke grîng dileyze, Di rêya Belavkirina înfomasyona civakî medya ji civakêre hedefan nîş an dide û nîrxên civakî li ser nîga dihêle û hisên civakê di varên nîrxên civakî de bilind dike, wek mînak di civatêde belav kirina nîrxên civakî ên wek serxebûn, Azadî, Mafê mirovan û hwd. Bi vî awayî wezîfa motîvasyonê dileyze. Her weha di rêya belavkirina seneet û edebiyatê rolekê di pêş ketina civakê a kulturî de dileyze. Wezîfak medya yê din ewe ku çêkirina programên ş ahî yê ye dema mirov evaran piş tî kar ku westîyane û hemû malbat li male mirov dixwazin li prgramên ş ahîyê temaş e ki, medya di programên ş ahîyêde ji temaş evana re bernamêyên wek spor, muzîk, magazîn, Musabeqe u hwd. Pêş keş dike.

Çend gotin li ser têgihîş tina rojnamegerîyê

Rjnamegerî bi serê xwe îlmeke her weha mirov dikare bêje seneeteke jî. Rojnamegerî wek hemû ilman fizîk, matematîk, biyolojî, kimya, filolojî, lîngivîst û tarîx ew jî ilmekî bi serê xwe ye heger ne ilmekî bi serê xwe ba wê li hemû unîversîteyên cihanê fakulta (beş ê) ronmegerîyê bi serê xwe venebûya û xwendavana yê ne çûya 4-5 salan ne xwendina ji bo bi keribin wek her ilmekî din di vî ilmî deji xwe bighînin. Bi rahiş tina kamereke fotografa û avêtina çentakî ser milên xwe mirov nebe rojnamevan. Her weha lazime ferqa navbera publîsîst û rojnamevan bête diyar kirin, ji alîkî din lazime ferqa navbera ş owmen û rojnamevan jî bête dîtîn. Divê baş bête zelal kirin ku Her rojnamevan dikare publîsîst be lê her publîsîst nabe rojnamevan her weha rojnamevanek dikare bibe ş owmen lê her ş owmen nabe rojnamevan. Bawerim têgehe rojnamegerîyê li kurdîstanê hinekî tev li hev bûye hêjayî ev bê zelal kirin.

Struktura avkirina dezgehên medya li Baş ûrê kurdistanê

Wek tê zanîn piş tî li baş ûrê Kurdistanê ku xelkê kurd azadî bi dest xist desthilatdarîya kurdistanê karekî pîroz kirin ku dest bi avakirina dezgehên dewletbûyîne kirin. Di destpêka vê protsesa han de bê guman deshilatdarîyê gelek zehmetî ji bo avakirina dezgehê kiş and, ji ber gelek sebebê cuda (bê îmkani, pêdekirina kadroyan û rewş a siyasî li hundur û derveyî kurdistanê) Lê tevî van hemû astengîyan deshilatdarîya kurdistanê di despêkêde gelek bi serketî di avakirina dezgehêde xebat kirin yek ji van dezgehêna dezgehên medya bû wek di gelek varan de di vî warî jî de kûrdan gelek xebat kirin karibin dezgehên medya kurdî ava bikin di despêkêde her çuqas tebînîyên mirov di vî warîde hebe jî ji ber rewş a wan ya teybet mirov ew fahm dikirin. Lê piş tî demekê êdî him li Kurdistana baş ûr her weha ji perçeyên kurdistanê yî din jî dengên ku êdî daxwaza medya hîn bi rêk û pêk tir hate kirin. Li ser vêya wezaret û dezgehên ku bi medya ve elleqedar bûn des bi hinek xebat kirin ku karibin medya baş ûrê kurdistanê hin çaktir bikin, wek tê zanîn gelek çalakî li dar xistin konferans , bi pisporanre têkilî kirin û hwd. Xebat li ser yasaya medya kurdistanê hate kirin. Di encamê van hemû xebatanan de îroj medya ku heye hate avakirin. Lê dema mirov nuha li vê medya a baş ûrê kurdistanê heye dinere wek tê zanîn ji deshilatê bigre û hetanî bi xelkê gazinan diki, gazinên herî paş î wek em di zanîn ji berêzan serokê herema kurdistanê Mesûd Barzanî, cîgirê serokê partîya demokrat a kurdistan Nêçîrwan Barzanî, serok komarê Î raq û sekreterê giş tî yekîtîya niş timanî kurdîstan Celal Talabanî ku di van bûyerên van ş apatê dawî ku li kurdistanê ru dan gazin kirin. Wek tê zanîn him deshilatdarî him jî opozisyon herweha xelkê jîmedya kurdî gazin kirin ku Medya kurdî bi erkên xwe ve ranabû.

Ji bo çi rewş a medya kurdî wehayê ? Bê guman sebebên wê hene ev sebebana heger mirov bi çend xalan bi nav bike yek wek diyare heta nuha dezgehek ku bi karibe karê medya di varê huqûqî de bi rêve bibe li wezaretê bi karê medya yê ve eleqedare ne hatîyê ava kirin ku ew bi karibe têkilîyên deshilat û medya di varê huqûqîde bi cih bike. Ku deshilat û medya jî bi zanibe her yek ji wan heq û


huqûqên wan ji ku heta kuye. Dudu lazime li vê wezaretê yasaya ku îzin dana lîzensîya ji bo medya zelal be. Sisê lazime komîteya kontrolkikirî na medya yê li tevaya welat li vê wezaretê hebe ew medya yê ku yasaya medya yê ya huqûqî, ewlekarîya netwî û ewlekarîya civakî ji alî moral û etîk binpê dike lazime li gor yasayê bêne ceza kirin. Ev li hemû welatan wehaye. Lê weha diyare car caran gelek li kurdistanê ji azadîya medya yê anarxîyê fem dikin lazime anarxî û azadîya medya ji hev bêne cuda kirin.

Rola medya di sazkirina raya giş tî de


Gotina raya giş tî kokên wê dighêje qirên 18 di dema tevgerên civakî hatin sazkirin Ev bi teybetî li welatên ewrûpî wek Fransa, (l'opinion publique) Rûsya (Общественное Мнение) û Înglîz (public opinion) di demên ku li van welatan tevgerên civakî dest pêkirin hate bi kar anîn. Lê ev gotina Raya giş tî hin berya qirên 18 bi du sed salî alîmê fransî Montaigne bi zimanê fransî vê termînê wek "l'opinion publique" behs dike. Di inglîzîde cara pêş in Bentham ev termîn "public opinion" bi kar anîye (http://en.wikipedia.org/wiki/Public_opinion). Ev termîn îroj weha diyare bi navê raya giş tî derbasî zimanê kurdî bûye. Lê li gor ilmê medya yê raya giş tî ewe ku li welatekî an di civatekê de qeneet di derheqa hemû tiş tên ku civatê elleqedar dike de ye, Ji alîkî din ve di derheqê tiş tên ku di civatê dibin û civatê eleqedar dikinde sazûna fikrekê ji mirovan re ye, ew fikir dikare pozîtîv an negatîv be, Lê ev protses ji alîkî de dikare zanebun be (pozîtîvbe), û ji alîkî din ve dikare nerazîbûn (negatîf) be. Nerazîbûn di kare di formek pir pasîvde be, yanî bes bi gotinan be an dikare bi awayekî aktîv wek xwepêş andan be. Li tevaya cîhanê heger hûn dixwazin di derbarê tiş tekîde raya xelkê wek hûn dixwazin be, kanalên xwe yê medya yê li gor wê bawerîya hûn dixwazin di hereketê xî hûnê encama ku hûn dixwazin bistînin. Medya Kurdî bêhtir di bin bandora medya biyanî deye û medya biyanî raya giş tî saz dike. Ew jî bê guman ji ber çend sebebên esasiye yek ji wan sebebên ne bûne Ajansê nuçeyê bi rêk û pêk e. Gelek caran medya Kurdî bi tevayî bi teybet medya online dîrek nuçeyên medya biyanî bi teybet ji medya welatê kurdistan dagir kirine di weş înin tiş tî herî xerab jî ewe ku bêyî jêder rê bidin. Diyare ew bi xwe jî ş erm dikin ku ji medya Tirkî ku li ser esasê nijadperestîya kurda hatîye ava kirin wek jêder rê bidin. Ji ber wê jî ew bê jêder nuçeyên wan dikin kurdî û belav dikin. Lê ew kesên ku bi amatorî van karê weha dikin naxînim ew çuqas tê dighên ku ew di saz kirina raya giş tî û çêkirina rojevê de di bin sebsbê ku kurd wek van medya yê ku ew dîrekt nuçeyên wan bê ku jêder rêbidin bi kar tînin bi fikirin dive mirov ji bîr neke kesek nuçeyekê bê bê armanc an bê berjewendî belav nake her nuçeyek a ku di medya yê de tê belav kirin armancek jê heye bawerim hew bêhtirîn medya kurdî difikire ku nuçe bê armance ji ber wê jî dîrekt nuçeyên biyanî bi teybet ên medya welatên serdest belav dikin. Ka em li lêkolînek li ser nijadperestîya medya tirk çêbuye binerin bê çî dijmanatîya kurdan dikin û medya kurdî jî bi teybet a online nuçeyên wan werdigerînin kurdî û belav dikin. Platforma Hevpar ya Mafê Mirovan (Î HOP)ê di çarçoveya bernameya tekoş îna bi cudaxwazîyê re li ser "nijadperestîya di çapemeniyê" de lêkolînek kir. Lêkolîn, ji aliyê mamostayê Fakulteya Ragehandinê ya Zanîngeha Enqerê Eser Koker û Ulku Doganay ve hat kirin. Lêkolîn li ser rojnameyên ku bi nijadperestîyê tînasîn 3 rojnameyên ku li Tirkîyê herî zedê difiroş in û tî xwendin ên wek Hurriyet, Zaman û Postayê û 3 rojnameyên heremî ên wek Güneyde İ mece, Yeni Balı kesîr, Sonsoz hat kirin. Her 6 rojname di sala 2006 û meha yekem a sala 2007an yanî 13 mehan hat ş opandin. Encamên lêkolînê jî bi pirtûkeke wek, "Em ne nijadperest in lê... Di çapemeniya nivîskî de gotinên nidapreset-cudaxwaz" ku ji 180 rupelan pêk tînin hat weş andin. Ji sedî 40ê Hurriyetê, ji sedî 29ê Zamanê nijadperestî yeDi lêkolînê de hezar û 616 nuçe û nivîs hatine analîzkirin û li gor vê yekê jî di 610 nuçeyên Hurriyetê de yanî ji sedî 40, di 443 nuçe û nivîsên Rojnameya Zamanê de ji sedî 29, di 234 nuçe û nivîsên Postayê de ji sedî 15 gotin û nêrîna "nijadperest-cudaxwaz" hatiye tespîtkirin. Di lêkolînê de ligel ku rojnameya Posta zimanekî nijadperest an tuj bikartîne ji ber ku rojnameyek meleze û zedetir nuçeyên magazinê diweş îne nijadperestîya wê ligel rojnameyên din hindiktir hatîye tespîtkirin.

Rola medya di sazkirina raya giş tî de


Guft û go Kurdîstan TV15 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 17, roj TV20, KNN 17, Kurd1 5, Gelî Kurdistan TV 5, Tîşk TV3, Peyam TV 4




Şîrove Kurdîstan TV12 , Kurdsat TV 11 , Zagros TV 11, roj TV24, KNN 18, Kurd1 5, Gelî Kurdistan TV 7, Tîşk TV5, Peyam TV 7



Nûçe Kurdîstan TV16 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 16, roj TV23, KNN 16, Kurd1, Gelî Kurdistan TV 7, Tîşk TV3, Peyam TV 5




Bername Kurdistan TV 17 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 14 , roj TV 20, KNN 18, Kurd1 5, Gelî Kurdistan TV 5, Tişk TV 3, Peyam TV 4




Rola medya di rojev çêkirinê de

Çêkirina raya giş tî mirov dikare bi kurtî bi vî awayî beje, Tişk tî ku medya granîyê didê û dixwaze ku di mejîyê civatê de bi cîh bike ku civat jî wî tişk tî ku medya dixwaze tîxe rojeva xwe. Gelek caran medya tişk tî ku ji civat lazime tîxe rojevê hîç behs nake û ji bo ku ew tişk tî ku ji civatê re lazime civat pê mijûl nebe tişk tekî dîn ku li gor berjewendîyê ew kesên ku medya yê kontrol dîkin dixin rojevê dakû berê raya giş tî bi alîkî dîn ve bibe ji pirsgrêkê wanê esasî bi dûrxe. Wek ku alimê Rûsî ê medya yê Zasûrskî dibêje “her çuqas medya ne her gav serketîbe ka lazime mirov çî bi fikirin û bêjin’ lê gelek serketîye ku bihêle civat di derheqê çide lazime bifikire” Ev tî vî wateye ku ne her gav tişk tî ku ji civatê re pêwîstin di rojewa civatê deye, bêhtirîn caran tişk tî ku medya dixwaze ji civatêre dîkin rojew.


Guft û go Kurdîstan TV13 , Kurdsat TV 12 , Zagros TV 14, roj TV21, KNN 18, Kurd1 4, Gelî Kurdistan TV 8, Tîşk TV5, Peyam TV 5




şîrove Kurdîstan TV15 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 16, roj TV19, KNN 16, Kurd1 5, Gelî Kurdistan TV 6, Tîşk TV4, Peyam TV 5



Nûçe Kurdîstan TV16 , Kurdsat TV 15 , Zagros TV 17, roj TV20, KNN 17, Kurd1, Gelî Kurdistan TV 7, Tîşk TV4, Peyam TV 4




Bername Kurdîstan TV16 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 15, roj TV16, KNN 16, Kurd1 7, Gelî Kurdistan TV 6, Tişk TV5, Peyam TV 5




Manîpulasyon di medyayê de

Medya gelek caran civatê manîpule dike. Gelek lêkolînên li ser manîpulasyona medya yê ku hatine kirin encamên gelek xerîb derketine. Wek mînak gelek caran ku medya yê di 10 rojande pisek xistîye rojeva civatê di encamên lêkolînan de hatîye eş kere kirin ku kesên di hundirê van 10 rojan de kemtir medya ş opandine bêhtir ji kesên ku pirtir medya ş opandina ev pîrsa ku 10 rojan di rojevê debû ji hev derxistine. Ev tê wê wateyê ku bêhtirîn caran medya serê mirovan tev li hev dike û nahêle ku mirov rastîyê fêm bike.


Guft û go Kurdîstan TV10 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 09, roj TV 24, KNN 16, Kurd1 00, Gelî Kurdistan TV 15, Tişk TV3, Peyam TV 9




Şîrove Kurdîstan TV11 , Kurdsat TV 13 , Zagros TV 09, roj TV 25, KNN 19, Kurd1 00, Gelî Kurdistan TV 11, Tişk TV3, Peyam TV 9



Nûçe Kurdîstan TV10 , Kurdsat TV 13 , Zagros TV 08, roj TV 23, KNN 20, Kurd1 00, Gelî Kurdistan TV 13, Tişk TV3, Peyam TV 10



Bername Kurdîstan TV11 , Kurdsat TV 13 , Zagros TV 09, roj TV 24, KNN 19, Kurd1 00, Gelî Kurdistan TV 11, Tişk TV4, Peyam TV 9




Rola medya di sazkirina ş uura netewî û paraztina ewlekarîya netewî de


Medya li hemû welatan roleke gelek pozîtîf di sazkirina ş uura netewî û paraztina ewlekarîya netewî de dileyze. Lê dema mirov behsa sazkirina ş uura netewî û paraztina ewlekarîya netewî ji alî medyade dike wê demê hinek pirs tên pêş îya mirov. wek mînak hinek jivan pisan evin: yek kî an kîjan dezgeh wê birayrê bide ka çi program dihêle ş uura netewî xurt bibe?, ki an kîjan dezgeh wê birayrê bide bê ka Paraztina berjewendîyê netewî çîye û çawaye? Her weha ku di civatêde li ser van pirsana cudatî hebe wê demê wê medya bi çi awayî tevbigere, ki an kîjan dezgeh wê bikaribe qerarê li ser vê tevgera medya bide? Wek mînak ez dibêjim him tarîxî ,him huqûqî, himjî coxrafî kerkûk bajarekî kurdî Kurdîstanîye lazime wer ser herema Kurdîstanê ez dihesibînim ev di

paraztina berjewendîyê ewlekarîya netewî deye, Yekî din dikare ew jî bêje raste kerkûk bajarekî kurdîye lê ne ş erte were ser herema kurdîstanê dibêje bira kerkûk statuyek wê yî bi serê xwe hebe û dibêje ev bêhtir di paraztina berjewendîyê netewî deye. Heger di civatê de du fikrên weha hebe. Medyayê çawa tevbigere û ki an kijan dezgeh wê bikaribe biryarê bide lazime medya çawa tevbigere. Gelek caran kêsên li ser hukum di bin navê paraztina berjewendîyên netewî de di xwazîn rê li ber azadîya fikrî bigrin. Wek mînak li baş ûrê kurdistanê car caran di telvîzyonên baş ûrê kurdistanê de zarokên kurdan ku sibehê dema diçin dibistanê berya dest bi dersê bikin marş ekê dixwînin dema mirov temaş ê dike marş a ku li hermê slêmanîyê zarok dibên û marş a ku li heremê hevlêr û dihoc zarok dibên cudaye. Di marş a a li Slêmanîyê tê xwendin zarok serokê xwe ş êx mehmûd bi nav dike û a ku li hevlêr tê xwendin zarok serokê xwe Mustefa barzanî bi nav dike her weha herdu marş na ş ibin hev. Ji alîkî din ve wek em dizanin çend sal berê li baş ûrê Kurdistanê hinekan xwestin guhertina ala kurdî marş a netewî ey reqîb bi guherin. Heger mirov bi hesabîne ku sembolên her miletêkî ên musterek henin bê guman ê kurdan jî dibê wehabe ji xwe miletê kurd nuha ji ber gelek sebebên perçeyê heger çend tiş tên ku îroj kurda dighîne hev hebe lazime mirov wan bi parê ze heger tiş tên kurdayê bê guhertin hebe wê al û ey reqîb ê herî paş îbe. Lê wê demê medya kurdî roleke erênî neleyst ku bersîveke bide van kesên ku dixwestin al u marş a netewî a kurdî biguherin û her weha di xwendina marş a her sibeh di dibistanên kurdî li baş ûrê kurdistanê lazime medya kurdî ji civata kurd re bide rêdan ku lazime yek marş ji bo zarokên kurdan ên diçin dibistanê hebe.


Guft û go Kurdîstan TV14 , Kurdsat TV 11 , Zagros TV 13, roj TV 07, KNN 11, Kurd1 13, Gelî Kurdistan TV 11, Tişk TV8, Peyam TV 02




şîrove Kurdîstan TV17 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 15, roj TV 08, KNN 12, Kurd1 14, Gelî Kurdistan TV 12, Tişk TV7, Peyam TV 01




Nûçe Kurdîstan TV17 , Kurdsat TV 15 , Zagros TV 16, roj TV 12, KNN 15, Kurd1 00, Gelî Kurdistan TV 14, Tişk TV6, Peyam TV 4




Bername Kurdîstan TV09 , Kurdsat TV 12 , Zagros TV 08, roj TV 26, KNN 21, Kurd1 00, Gelî Kurdistan TV 12, Tişk TV3, Peyam TV 9




Civakî Kurdîstan TV13 , Kurdsat TV 11 , Zagros TV 17, roj TV 12, KNN 00, Kurd1 15, Gelî Kurdistan TV 00, Tişk TV05, Peyam TV 02




Kultur Kurdîstan TV20 , Kurdsat TV 18 , Zagros TV 17, roj TV 14, KNN 00, Kurd1 20, Gelî Kurdistan TV 00, Tişk TV08, Peyam TV 03



Şahî Kurdistan TV19 , Kurdsat TV 17 , Zagros TV 18, roj TV 18, KNN 00, Kurd1 19, Gelî Kurdistan TV ,
Tişk TV06, Peyam TV 03



Dîrok Kurdistan TV13 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 12, roj TV 14, KNN 06, Kurd1 18, Gelî Kurdistan TV
06, Tişk TV10, Peyam TV 07




Di medya de Autokontrol, kontrol û sensur û Rojnamegerîya objektîv


Objektî vbûn di rojnamegerîyê de gotinek abstrakte heger mirov îroj li navendên lêkolînan û unîversîteyên cîhanê binere ên ku li kolînan li ser medya yê dikin van mirov dikare lêkolînan di sê nerînan de da beş bike. 1 nerna L1 beralö 2. Nerîna Pluralîst, 3 nerîna marksîst. Dema mirov li van hersê nerînan ku di lêkolînan li ser medya dinere mirov dighê encameke ku objektîvbûn di medya de relatîfe (nîsbî). Nerînê di lêkolînan Liberal û Marksîste li ser medya Nêzîkayak heye bes îdeologê liberal dihesîbinin raste aborî û hukum di destê kê debe ew medya kontrol dike, lê îdeologê lîberal dihesîbinin ku îdeologê marksîst ên medya wek alimê Fransî Louis Althusser rola hukum û aborîyê di medya de gelekî mezin digrin ûrola medya ne wek marksîst dibênn îdeolojîke, lîberal dihesîbinin ku di van şertna de jî medya dikare objektîv be û rola wê ne 1 deoljîk be. Lê plûralîst ku îdeologên wan di warê medya de alimên înglîz Williams, Thomson û Hoggart' di hesîbîn ku lazima mirov li medya ne wek Marksîst ji alî aborî û hukumde lê binere lazime mirov madya li ser asasê kulturê lêkolîn bike wê demê wê rola medya bête eşkere kirin. Nerîna pluralîst dihesîbî ne ku pêş ketina aborî û teknîkî gelek 1 mkan xistîye destê Medya û medya lazime vêya bê alî û objektîv bikar bine.ji ber wê me li jor got kû objektîv bûn di medya de relatîve (Nîsbî).

Wek tê zanîn pirsê autokontrol, kontrol û sensur li gelek welatan hertim di rojewêdeye û tê munaqes ekirin ev pirs gelek tevliheve, mirov nazane ka li ku hudûdê navbera van hersê tiş tan dighê hev an li ku ji hev di qeti, di rastîya xwede hudûdê navbera wan mehîyaye, herkes li gor xwe an bi awayekî din wek dixwaze hudûdê navbera van hersîyan dide diyarkirin. Sîtemeke ûnîversal ku bêhtirîn welatên cîhanê li ser li hev kiribe nîne. Deme mirov li vê pirsê dinere mirov dibîni ku ev pirs li her welatekî bi awyekî hatiye runiş tandin. Li welatên ku sîstema dewletê baş rûniş tîye ev sîtem bi awayê autokontrol û kontrol dimeş e lê li welatên ku sîstema dewletê baş ne runiş tîye ev sîstema bi awayê sensurê an bi awayekî din bi qerarnama dimeş e. Di rastî de ev hersê tiş t di encamêde yek rolê dileyzin (kontrolkirina medya). Ferqa navbera van hersê tiş tan wek ferqa navbera asîmlasyon û întegrasyonê ji bo milletekî bindeste. Wek çawa gelek caran ku siyasetmedarên Turk dibêjin lazime Kurd întegreyî civata Turkan bivin, di rastîya xwede ew dixwazê bêje lazime Kurd asîmle bibin lê ji bo gottî na asîmle pir feeş e ş una wê gotina întegrasyonê bi kar tînin.


Nûçe Kurdîstan TV11 , Kurdsat TV 13 , Zagros TV 09, roj TV 18, KNN 14, Kurd1 00, Gelî Kurdistan TV 17, Tişk TV07, Peyam TV 11




Guft û go Kurdîstan TV12 , Kurdsat TV 13 , Zagros TV 10, roj TV 17, KNN 13, Kurd1 04, Gelî Kurdistan TV13, Tişk TV 06, Peyam TV 12



Bername Kurdîstan TV12 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 11, roj TV 19, KNN 18, Kurd1 05, Gelî Kurdistan TV12 , Tişk TV06, Peyam TV 03



Buyer Kurdistan TV11 , Kurdsat TV 13 , Zagros TV 11, roj TV 16, KNN 16, Kurd1 00, Geli Kurdistan TV 14, Tisk TV08, Peyam TV 11




Wekhevî ya **Jin û Mêr** di medya Kurdîde


Wek tê zanîn ev pirsê wekhevîyê di medya yê de yek ji pirsên nuha ku di medya cihanî de pir aktîv têtê munqêş ekirin. Bê guman ev pirsê gelekî grînge ji bo pêş ketina medya yê di welatêkî de. Heger mirov bihesibînê li hemû welatên cihanê hejmara jinan û mêran hemme bêje di zik hevde niv nibe lazime di medya de jî heger ne nîn niv be jî lê lazime nêzî hev be lê pir heyf dema mirov di derbarê vê pirsê de li medya welatên cîhnê dinere rewş eke gelek xerab têtê ber cavê mirovan, her çuqas gelek welatan di vê pirsê de gelek gavên pêş dejî avêtine bi teybet welatên wek Îskandinavya (Swêd, Norwêç û Danîmark), Baltîka (Estonya, latvîya û letonya) Rûsya, Fînlândiya, Holanda Belçîka û gelek welatên din. Lê dema mirov di vê pirsê de li medya kurdî dinere medyak patri yalhal derdikeve ortê, rismekî kadstrofê têtê ber cavên mirov di medya kurdîde, jin hewqas kême kû mirov

wê wek kastrof dikare bi nav bike, her çuqas van ş apatên dawî mirov dibîne ku hêndîk bejî êdî jin dest bi ronjnamegerîyê dikin ev jî bê guman edî mirovan di vê pirsê de ji bê hêvîtyê xelas dike.


Nûçe Kurdîstan TV15 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 15, roj TV 17, KNN 15, Kurd1 00, Gelî Kurdistan TV 13, Tişk TV 09, Peyam TV 02




Guft û go Kurdîstan TV13 , Kurdsat TV 13 , Zagros TV 13, roj TV 16, KNN 14, Kurd1 11, Gelî Kurdistan TV 10, Tişk TV08, Peyam TV 02




Bername Kurdîstan TV13 , Kurdsat TV 12 , Zagros TV 12, roj TV 16, KNN 13, Kurd1 12, Gelî Kurdistan TV 11, Tişk TV09, Peyam TV 02



Ş îrove Kurdistan TV12 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 14, roj TV 15, KNN 14, Kurd1 08, Geli Kurdistan TV 11, Tisk TV09, Peyam TV 03



Civakî Kurdistan TV14 , Kurdsat TV 14 , Zagros TV 15, roj TV 16, KNN 14, Kurd1 10, Geli Kurdistan TV 08, Tisk TV07, Peyam TV 02



Rola avayên bingehî bajar û Gundan di belav kirina medya civakî û çapkirî de

Ji bo li welatekî medya civakî (facebook, twîter, hwd.) û çapkirî (rojname, kovar û hwd.) pêş keve yek ji gavên esasî ewe ku lazime li bajar an gundan strukturên esasî bêne avakirin yanî berya her tiş tî çar tiş tên esasî lazime bêne avakirin 1- sîstema poste lazime bi rêk û pêk be. 2-lazime sîstema komunikasyonê li hemû bajar û gund bête ava kirin ji bo ku internet bê bi kar anîn. 3- lazime hemû kuçe û rê bête nav kirin. 4- lazime hemû mal bête bi numre kirin. Heta ev hemû tiş t neyê ava kirin zehmete mirov di derbarê belavkirina medya civakî û çapkirî de tiş tekî konkret bêje, heger ev sîstema ku me li jor behs kir li bajar an gundekî nebe ewê medya civakî û çapkirî her dem bi hududbe yanî kêma kes ji civakê wê bi karibe bi kar bine. Di pirsê de jî weha diyare rewş a baş ûrê kurdistanê ne di rewş eke weha deye ku mirov bi karibe pê dilxweş bibe. Wek minak bêhtirin Kurdên kurdîstana Baş ûr îroj nakarin madya sosyal bi kar binin ji berku hukumeta herema kurdistanê heta nuha sîstema komunikasyonê li bajar û gundên kurdîstanê ava nekirine, mînakê din wek tê zanîn kovar û gazetê kurdistanê jî 1 roj wek tî xwestin nayên belav kirin heger karkirê an xwedevanek kovar an rojnamek li bajêr ji dikane dikirî ew bi xwe li unîversîte an karkirê li kehwê wê wê kovar an rojname bixwîne û bêtirîrî caran li ş ûna xwe dihele. kêma caran li gel xwe dibe malê. Lê heger sîstema postê baş kar bikira xelkê bibûna abonemangê kovar û gazeta û di her malakê de ş ûna bes yekî ku li öarş îya bajêr rojname an kovar bikirya û bi xwenda wê hemû ferdên malê en xwendin û nivîsandina wan heba wê ew bi xwenda. Evê ya bi xwera zanebûn û pêş ketina civata kurd wê bi xwera bi anîya.

Unîversîteyên Baş ûrê kurdîstanê û bêş ê wan yê Rojnamegerîyê

Li Kurdîstanê wek tê zanîn li Unîversîte wek a Sulêmanîyê a Selhedîn û weha diyare li hinekî din beş ê rojnamegerîye heye û gelek xwendevanên kurd li van zanîngeha di xwînin lê weha diyare heta nuha perwerdeyê bi rêk û pêk ku wek sîstem runîş tibe nehatîye avakirin gelek ji van pirsên di vê nivîsê de hatine ş rove kirin gelek ji wan di perwerdeya fakultên rojnamegerîyê de tî çareser kirin. Her weha ji bo dezgehên medya Kurdî lazime kadroyên profesîonal ji van zanîngeha bête derxistin ku bi karibin Medya Kurdî bi rêk û pêk îdare bikin Her weha divê li van zanîngehan bi sedan Lêkolîn, Tezên Diktorayê liser hemû pirsgrêkên medya Kurdî bête çêkirin. Lê pir heyf weha dîyare heta nuha sîstemek weha ne hatî ye ava kirin. Nuha di dema min vê lê kolîna bi çûk li ser medya kurdî çêkir min na karibû lêkolînek liser rewş a medya kurdî a van demên dawî bi dest xistata belkî ev kêmaya mine ku min nakaribû pêde bikira, lê wezîfa van zanîngehan ewe ku heger tezê wan hebî lazime balav bikin û bi hesanî kurd bikaribin bi kar binin.


Tunebûna Ajanseke nûçeyan a Kurdî bi rêk pêk û teesîrên wê li ser medya Kurdî

Tunebûna Ajanseke nûçeyan a Kurdî bi rêk pêk dibe sebebên ku medya kurdî di bin teesîra medya Tirkî, Erebi û farîsî de dimîne, ew ji di be sebebên di sazkirina raya giş tî û rojew çêkirinê de rola wan medya welatên dagîrker li ser medya kurdî gelek zêdeye. Ev yek ji pirs grêkên cidî ku li pêş îya medya kurdî bi tevayî û bi teybet medya baş ûrê kurdistanê ye. Her çûqas nuha hinek Ajansên nûçeya hebin jî lê diyarê ew ji bin vî barî nikarin rabin. Heger kurd medya xwe bi rêk û pêk nekin û daxwazê civata kurd di warê medya de bê bersîv bihêlin wê demê Kurdê li teş evîzyonên biyanî bi teybet ên dewletên dagirker binerin ji ber Kurd gelek ji wan bes zimanê duda ên dewletên dagirker dizanin ev tê wê manê ku wê kurd wek ew dixwazin bifikirin.

Tevli hevviyên li herema rojhilata nave rast ên van 20 salên dawî û hebûna tevgera kurd wek faktorekî esasî li heremê hîş t ku hinek welatên biyanî ku li ser herema rojhilata naverast xwedî hesabin bi zimanê kurdî dest bi weş ana bikin wek tê zanîn Radyoya dengê Amerîka (bi zaravên soranî û kurmançî) ku weş anên wê behtir berê ber bi Kurdî stana Baş ur,Rojhilat u Rojava veye, her weha Radyoya dengê Rûsya (ku bes bi kurmançîye her weha bernameyê zazakî (kirdikî jî her hefte pêş keş dike, carna bi soranî ji roprtaj hene) ku bêhtir berê wê berbi Kurdistan Bakur veye. Her weha wek em dizanin du dewletên kurdîstan dagir kirine jî weş ana televîzyonê bi zimanê kurdî dikin wek televîzyona îranê ‘Seher’ û a Turkî ‘TRT 6’. Bê guman ev ji weş anên DYA û Rûsya ferqe Turk û îran di rêya weş anên xwe dixwazin ş uûra netewî a kurdan ji ortê rakin lê DYA û Rûsya problemek wana weha nîne, belovacî feda kurdan di weş anên wan de heye. Di herdu radyoyan de (Dengê Rûsya û Dengê Amerîka) bernameyên ser dîrok, edebiyat, kultur, ziman û civata kurdan tene çêkirin.bernameyên ku ş uura netewî xurt dike di weş înin. Dema mirov nuha li TRT 6 dinere her kû dihere propaganda olî tede zêde dibe Encamên jêrîn îspata vê ye.


Rola Olî (Dîn) Di TRT de (TRT,TRT 6, TRT 1, TRT Awaz, TRT Anadolu,)

Nuçe Di TRT de (TRT 17,TRT 6 31 , TRT 1 18, TRT Awaz17, TRT Anadolu17)




Bername Di TRT de (TRT 10,TRT 6 37 , TRT 1 11, TRT Awaz31, TRT Anadolu11)

Bername olî di TRT de




Guft go (TRT 11,TRT 6 37 , TRT 1 10, TRT Awaz33, TRT Anadolu9)

Guft go li ser olê di TRT de



Şîrove (TRT 10,TRT 6 32 , TRT 1 12, TRT Awaz35, TRT Anadolu 10)

Şîrove li ser olê di TRT de



Televîzyonên Kurdî ji alî teknîkî ve

Gelek baş(GB), Baş û ne pir baş(npb)

Grafîk : Kurdîstan TV npb, Kurdsat TV baş, Zagros TV npb, roj TVnpb, KNN npb, Kurd 1npb, Gelî Kurdistan TV baş, Tişk TVnpb, Peyam TV npb

Dîmen: Kurdîstan TV baş, Kurdsat TV baş, Zagros TV baş, roj TV baş, KNN baş, Kurd 1 baş, Gelî Kurdistan TV baş, Tişk TV npb, Peyam TV npb

Dekor: Kurdîstan TV npb, Kurdsat TV np, Zagros TV baş, roj TV baş, KNN baş, Kurd 1np, Gelî Kurdistan TV baş, Tişk TVnpb, Peyam TV npb

Jenerîk: Kurdîstan TV npb, Kurdsat TV baş, Zagros TV npb, roj TV, KNN npb, Kurd 1npb, Gelî Kurdistan TV baş, Tişk TVnpb, Peyam TV npb

Sîstema opertorîyê: Kurdîstan TV npb, Kurdsat TV npb, Zagros TV npb, roj TV, KNN npb, Kurd 1npb, Gelî Kurdistan TV npb, Tişk TVnpb, Peyam TV npb

Heger mirov lê binere mirov dibîne ku medya kurdî bi tevayî û bi teybet televîzyon her çuqas di van ş apatên dawîde gavên pêş de avête bi jî lê medya kurdî ne di halekî baş deye bi kurtî mirov dikare bêje medyak

partîfîye û amatore. Sebebên vêya her çuqas dikare gelek tiş t din binjî lê sebebê asasî ne bûna struktûrêk medya yê bi rêk û pek li baş ûrê kurdistanê ye her weha sebebên herî asasî kêmbûna kadroyên profesyonel ku ji karê medya baş fam dike di medya kurdî deye. Her çî xerîbe di atmosfera kurdî de de fikrek pîrîmîtv hakime ku hinek mirov difikirin ku her tiş t bi paran dibe. Lê vaye jiyan ji mera dide rêdan ku ne wehaye, vaye nuha medya kurdî li baş ûrê kurdistanê teknîka herî pêş bi kar tînin û weha diyare îmkanên wan yên madî jî ne xerabe lê vay em di bînin ku medya me di ç halî deye. Di dawîyê de di xwazim bêjim bi paran tenê kadro û karên baş nabe lê kadro dikarin para pêde kin û karên herî baş bikin. Heger em kurd ji bi vê formûlê tevbigerin ewê gelek pirsên me yên medya herweha gelek pirsên me yên din wê bîn çareserkerin . Çareserîya her tiş tî kadroyên profesîonale.

P.S. Bê guman gelek dikarin bêjin ku ev pirsên ku di vê lêkolîna biçûk de hatine rojewê her yek ji wan lazime lêkolînek dirêj bi serê xwe be raste ez jî weha difikirim. Lê hedef ji vê nivîsê ewe ku yek jê bala dezgehên medya kurdî, Unîversîtên Kurdîstana baş ûrê xwendevanê wan beş ê medya herweha rojnamevanên Kurd bikş înim ser van pirsan herweha bala munqes a li ser medya Kurdî ku tradî tsîonel bes di çarçewa dîrokîdeye bikş îne ser van pirsgrêkê medya ên aktuel. Armançek din ew bû ku min bi xwe xwest li hember propaganda ku gelek caran tê guhê mirov ku'karê ilmî mirov bi kurdî an kurmancî nakare bike' ji ber wê mi xwest wek bersîvek ji wan kesan û dezgehan re, ku mirov bixwaze dikare karê ilmî bi kurdî jî bike. Bê guman dizanim gelek kêmayê vê nivîsê hene bi teybet di vareze termînolojî delê em bixazin em dikarin hêdî hêdî kêmasîyên xwe ji ortê rakin. Heger di van pirsan de ev nivîs bûbe alîkar we baş be. Ez ş îrova serkeftî an ne serkeftûbûna vê nivîsê ji xwendewanare dihêlim. Ev Lêkolîna li ser asasê heftakê li ser TV Kurdî hatîye kirin.

Jêder

Бжезинский З. Выбор. Глобальное господство или глобальное лидерство. -М.: Международные отношения, 2005.
Буданцев Ю.П. Теория и практика журналистики и массовых информационных процессов. М., 1993. Вартанова Е.И. Медиаэкономика зарубежных стран. М.: Аспект, 2003.

Волкова В.В. Дизайн-система «Реклама». Журналистика в 1994 г. МГУ, 1995.

Штак М.И. Журналы в системе СМИ: типология и «ниши» изданий // Типология периодической печати / Под ред. М.В. Шкондина, Л. Л. Реснянской. М.: Аспект Пресс, 2007.

Суверенитет / сост. Н. Гараджа. -М.: Европа, 2006.

Тертычный А.А. Жанры периодической печати. М.: Аспект-пресс, 2002

Цвик В.Л. Реклама как вид журналистики: Учеб. пособие / Ин-т соврем, искусства. М., 2001

Язык средств массовой информации. Уч. пос. под ред. М.Н. Володиной. - М.: Академический проект, 2008.

Поченцов Г.Г. Паблик рилейшнз. - К., 1998.

Слесаренко И. Камни преткновения в деятельности и исследованиях масс-медиа и массовых коммуникаций // Украинская журналистика в контексте мировой: Сб. научн. трудов / под гл. ред. проф. В.И. Шкляра. - К.: Центр свободной прессы, 1998.

Моисеев В.А. Паблик рилейшнз: Теория и практика. - К.: ВИРА-Р, 1999.

СМИ в условиях глобальной трансформации социальной среды. – М., 2008.

Из истории рекламы // Лазурь. – 2007.

Мурзин Д.А. Феномен корпоративной прессы. - М., 2005

Федеральный закон «О средствах массовой информации».

Дурнова Л.В. Информационная политика как инструмент государственного управления /Взаимодействие власти, СМИ и общества в реализации миграционной политики: Материалы межрегион. науч.-практ. конф. - Астрахань: Изд-во Астрахан. ун-та, 2006.

<http://www.kurdistantv.net>

<http://kurdsat.tv>

<http://www.kurd1.com>

<http://www.roj.tv/>

<http://www.zagrostv.com/>

<http://gelikurdistan.net/>

<http://www.payam.tv/kurdish.aspx>

<http://www.tishktv.tv/live/news.php>

<http://www.knntv.net/>

Bennett, W. L. (2000), Politik İ llüzyon ve Medya, İ stanbul, Nehir Yayınları .

Barbier, F. ve Lavenir, C. B. (2001), Medya Tarihi, İ stanbul, Okuyan Yayınları .

Bennett, W. L. (2000), Politik İ llüzyon ve Medya, İ stanbul, Nehir Yayınları .

Bourdieu, P. (2000), Televizyon Üzerine, İ stanbul, Yapı Kredi yayınları .

Bottomore, T. B. (1990), Seçkinler Toplumu, Ankara, Gündoğ an Yayınları .

Chomsky, N. ve Herman, E. S. (1999), Medya Halka Nasıl Evet Dedirtir, İ stanbul, Minerva Yayınları .

Freire, P. (1995), Ezilenlerin Pedagojisi, İ stanbul, Ayrintı Yayınları .

Herman, E. S. (2004), “Kelime Hileleri ve Propaganda”, Chomsky, N. vd. Medyanın Kamuoyu İ malatı , İ stanbul, Chiviyazıları Yayınları .

İ şık, M. (2002), Kitle İ letiş im Sistemleri, Konya, Eđ itim Kitabevi.

Jeanneney, J. N. (1998), Medya Tarihi, İstanbul, Yapı Kredi Yayınları .

Mass-media and Democracy. Bonn: Conrad Adenauer Foundation, 2006

Media and Global Divides. IAMCR World Congress. Stockholm, 20 -25 July, 2008 // Nordicom Review. Vol.30. June, 2009.165. media.guardian.co.uk/newmedia/story (2005, November 25).

Hadenius, Stig, Weibull, Lennart & Wadbring, Ingela (2008): Massmedier. Press, radio och TV i den digitala tidsåldern. Stockholm: Ekerlids förlag.

Thompson, John B. (2001): Medierna och moderniteten. Göteborg : Daidalos.

Regeringens proposition 2000/01:94 (2001): Radio och TV i allmänhetens tjänst 2002-2005.

”Farliga publikationer och skadliga populariseringar” i Vetenskapens populära gestaltningar, Rapport från en konferens om Popularisering av vetenskap och forskningsinformation, Centrum för Medieforskning nr 3/1998, Högskolan i Halmstad.

Jönsson, Anna-Maria & Strömbäck, Jesper (2007): TV-journalistik i konkurrensens tid: nyhets- och samhällsprogram i svensk TV 1990-2004. Stockholm: Ekerlids förlag.

Kasperowski, D (1997):”Kritik och service: Två fält om vetenskap, media och samhälle” i VEST, nr 3-4, 1997

Kommittédirektiv Radio och TV i allmänhetens tjänst Dir. 2007

Ekström, Mats (1999): ”TV-tittande och demokratin” i Politikens medialisering, SOU1999:

Drotner, Kirsten m fl (1996): Medier och kultur. En grundbok i medieanalys och medieteori. Lund: Studentlitteratur.

Abrahamsson, Ulla B (1999): I allmänhetens tjänst. Faktaprogram i radio och television 1955-1995. Stockholm: Prisma.

<http://www.nefel.com/>

<http://www.netkurd.com/>

<http://www.rizgari.com/>

<http://www.kurdinfo.com/>

<http://rojevakurd.com/>

<http://www.hawarnet.com/>

<http://www.pukmedia.com/>

<http://peyamner.com/default.aspx?l=5>

<http://www.kulturname.com/>

<http://kurdistan-post.ru/>

<http://aknews.com/ki/>

<http://kurdistan.nu/>

<https://newroz.com/>

<http://www.firatnews.com/>

<http://rus.ruvr.ru/>

<http://www.voanews.com/kurdi/news/>

<http://www.niviskar.se/>

<http://www.haberdiyarbakir.com/index.php>

<http://kurdistan.ru/>

<http://www.kurdistanmedia.com/>